DAYÎNA KIRÊYÊ

Kirêdar: Mafên Xwe Bizanin!

Xwediyê xaniyê we dikare dozê li we veke eger deynê we yê kirêyê hebe an jî hûn kontrata xwe ya kirêyê binpê bikin, lê ew NIKARE:

- Mifteyan biguherîne da ku we ji xanî derxîne
- Xizmetên gîştî betal bike (kareba, av, gaz)
- Eşya û kelûpelên we biavêje kolanê an ji xanî derxîne

Heke ev tişt qewimî, telefonî Parêzerê Mafê Tehliyeyê bikin.

Dayîna kirêya min kengê ye?



Heke kontrateke we ya heyî an qediyayî hebe...

Kirêya we divê **di roja ku li ser kontrata we hatî diyarkirin de** were dayîn. Piştî ku kontrata we ya kirêyê qediya, kirê **dîsa jî di heman rojê de tê dayîn** heta ku hûn û xwediyê xaniyê we ji bo rojeke cuda li hev nekin. Bi gelemperî, ev tê wateya **roja yekê ya mehê.**

Heke kontrateke we ya kirêyê qet çênebûbe...

Kirêya we di **roja ku we bi xwediyê xaniyê xwe re li ser li hev kiriye** de tê dayîn. Heke we li ser dîrokekê li hev nekiribe, kirêya we divê her meh di heman roja ku we cara yekem heqê kirêyê daye de were dayîn.

Kengê xwediyê malê dikare kirêya min zêde bike?



Heke kontrateke we ya heyî an qediyayî hebe...

Xwediyê xaniyê we **nikare** kirêya we zêde bike heta ku kontrata **kirêya we neqede**. Piştî wê, ew girêdayî wê yekê ye bê ka di kontrata we de çi dinivîse. Divê **bi kêmanî berî 30 rojan hûn agahdariyê** wergirin û **di hin rewşan de**, dibe ku hûn **maweyeke zêdetir** heq bikin (**wekî 60 an 90 rojan**).

Heke kontrateke we ya kirêyê qet çênebûbe...

Ew girêdayî wê ye bê ka hûn **bi çi sixletî kirêyê didin**. Heke hûn **hefteyê carekê** kirêyê didin, divê hûn berî **10 rojan agahdariyê wergirin**. Heke hûn **mehê carekê** kirêyê didin, divê xwediyê xaniyê we herî kêm **berî mehekê** bi we bide zanîn.

Çi dibe heke ez kirêyê bi derengî bixim?

Heke kontrateke we ya heyî an qediyayî hebe...

Ji destpêka dîroka dawî ya dayîna kirêya we ya di kontratê de diyarkirî û bi şûn de, ji bo dayîna kirêyê **5 roj** qewlê we heye. **Piştî ku** ew 5 roj derbas bûn, xwediyê xaniyê we dikare bi qasî **%10ê** kirêya we **heqê derengmanê** ji we daxwaz bike û **ji bo tehliyekirina we dozê li we veke.**

Heke kontrateke we ya kirêyê qet çênebûbe...

Hûn **hîn jî** wekî kesekî xwedî kontrata kirêyê xwedî **heman mafan** in! Ji bo dayîna kirêyê **5 rojên** we hene û xwediyê xaniyê we **nikare we ji xanî derxe bêyî ku pêşî we bide dadgehê.**

Derbarê dayîna kirêya xwe de divê ez wekî din çi zanibim?

Dayîna kirêya xwe RANEWESTÎNIN ji ber ku xwediyê xaniyê we tamîratan çênake!

Heke hûn vê yekê bikin, dibe ku xwediyê xaniyê we we tehliye bike. Heke hewcedariya we bi tamîrkirinê hebe, **telefonî Parêzerê Mafê Tehliyeyê bikin.**

Xwediyê xaniyê we **ne** mecbûr e ku **kirêya derengîketî** an **peredayîna qismî** qebûl bike, lê dîsa jî wî pereyî xerc nekin! Heke xwediyê xaniyê we, we bide dadgehê, **dibe ku dadger biryarê bide ku ji bo mayîna di malê de hûn vî pereyî bidin.**

KURDISH KURMANJI - Paying the Rent KYR

LEGAL AID SOCIETY (833) 837-HOME

NHBA (615) 701-7957

AMAC (615) 988-6460

NASHVILLE CONFLICT RESOLUTION CENTER

ROOFTOP NASHVILLE

Ev agahdarî tenê ji bo Davidson County ye. Agahiyên li vir hatî dayîn armanc nake ku pêşniyaza qanûnî pêk bîne. Heke pirsgirêkeke we ya hiqûqî hebe, ji kerema xwe telefonî parêzgerekî taybet bikin an telefonî Komeleya Alîkariya Hiqûqî ya Middle Tennessee ya herêmî bikin an jî bi riya hejmara 1-800-238-1443 telefonî ofîsa Cumberlandsê bikin an jî bi riya hejmara 1-615-701-7957 telefonî Yekîtiya Baroyan a Nashville Hîspanîkê bikin. Di 5/24an de hat revîzekirin.

DAYÎNA KIRÊYÊ

Kirêdar: Mafên Xwe Bizanin!

Ji bo dayîna kirêyê pêwîstiya we bi alîkariyê heye?

Berî her tiştî telefonî 211ê bikin.

United Way, ji saziyên mezin ên xêrxwaziyê yên ku li Nashvilleê alîkariya kirêyê dabîn dikin heta dêran û navendên civakî, lîsteyeke nûjenkirî ya her saziyekê tomar dike.

Opsiyonên Din

Rooftop Nashville	https://www.rooftopnashville.org/get-help (615) 485-5920
Needlink	https://www.needlink.org/get-help (615) 269-6835
Catholic Charities	https://cctenn.org/get-help-now/ (615) 352-3087
Metro Action Commission	https://www.nashville.gov/departments/metro-action/ (615) 863-8860
Operation Stand Down TN **(Ji bo xaziyan)**	https://www.osdtn.org/housing-and-financial (615) 248-1981
St. Luke's Community House **(Ji bo malbatên xwedî zarok)**	https://www.stlch.org/familyempowerment/ (615) 350-7893

Ji Bo Kesên Ku Rastî Tundûtûjiya Navmalbatî Tên

TN Coalition to End Domestic Violence	https://tncoalition.org/get-help/emergency-financial-assistance/
Mary Parrish Center	https://www.maryparrish.org/ (615) 256-5959

KURDISH KURMANJI - Paying the Rent KYR

LEGAL AID SOCIETY (833) 837-HOME | NHBA (615) 701-7957 | AMAC (615) 988-6460 | NASHVILLE CONFLICT RESOLUTION CENTER | ROOFTOP NASHVILLE

Ev agahdarî tenê ji bo Davidson County ye. Agahiyên li vir hatî dayîn armanc nake ku pêşniyaza qanûnî pêk bîne. Heke pirsgirêkeke we ya hiqûqî hebe, ji kerema xwe telefonî parêzgerekî taybet bikin an telefonî Komeleya Alîkariya Hiqûqî ya Middle Tennessee ya herêmî bikin an jî bi riya hejmara 1-800-238-1443 telefonî ofîsa Cumberlandsê bikin an jî bi riya hejmara 1-615-701-7957 telefonî Yekîtiya Baroyan a Nashville Hispanîkê bikin. Di 5/24an de hat revîzekirin.